RSDK info
Rexistina Sosyalist ya Demokratik ya Kurdistane
Hejmar 1




# BIJÎ YEKÊ GULANÊ

Gelê me roja navneteweyî ya yekitî, têkoşîn û piştgirîya gelên karker û xebatkaran 1ê Gulanê di pêvajoyeke taybetî û dîrokî de pîroz dike. Ji ber ku gelê Kurdistana Başûr di warê şikestandina zincîrên bindestî û kolonyalîzmê de kês û firsendeke dîrokî bi dest xistiye. Başûrê Kurdistanê berbanga azadiyê dijî. Gelê me li her çar perçeyên Kurdistanê azadiya Başûrê Kurdistanê û 1ê Gulanê bi ruhekî şoreşgerî û coşeke mezin bi hevre pîroz dike.

Lê Gulanê di eynê demê de, sembola têkoşîna li dijî kolonyalîzmê, bindestîya neteweyî û nîjadperestiyê ye. Di roja îro de, vê dînamîka herî mezin ruhê 1ê Gulanê dide jiyandin. Ji ber vê yekê, azadbûyina Başûrê Kurdistanê di serî de ji bo gelê Kurdistanê, lê herweha ji bo tekoşîna hemû gelên heremê û dinyê jî bidestxistineke gelekî mezin e. Rûxandina rejîma dîktatorên Seddam bi awakî giştî ji bo gelên Iraqê û bi taybetî ji bo gelê Kurd asoyên nû vedike.

Bê gûman mirov şer naxawaze. Eger mirov neçar nemîne, tu gel mêldariya şer nake. Di şeran de yên ku herî êş û zerarê dibîne çîna karker û kedkar in. Di şerê Iraqê de jî dîsa ev beşê civatê zerar û êşa herî mezin dîtin. Berpirsiyarê vî şerî, di serî de karbidestiya Seddam, Emerîka û Îngilîstan jî di nav de dewletên emperyalîst-kapîtalîst in. Gelê Başûrê Kurdistanê demek dûr û dirêj li dijî rejîma Seddam ya kolonyalîst şer kir û gelek bedelên mezin da. Gelê Başûrê Kurdistanê îro berhemên vê xebat û têşonîna xwe dide hevdu. Gelê me ji nakokî û valahî vî şerî hinek destketiyên nû bi dest xist. Mafê kesekî tuneye ku bi navê şoreşgerî û antî-emperyalîzmê teoriyên komployên nû biafirîne û sîdariyê têxe ser vê xebat û têkoşîna bi zahmet ya rewa.

Bi munasebeta roja yekîtî û têkoşînê ya navneteweyî 1ê Gulanê, di serî yên Turkiyê, em gazî hemû hêzên pêşverû û demokrat yên navçe û dinyê dikin ku helwesteke rast û durust bigrin; piştgiriya azadiya gelê Kurd bikin. Ev di eynê demê de wezîfeyeke bingehîn ya ruhê enternasyonalîst ya 1ê Gulanê ye.

Di pêvajoya şerê Iraqê de, ji ber fobiya kurdî, nîjadperestên Turkiyê careka din cîzmeyên bi xwîn yên şer xistin lingên xwe û şûrên xwe ji kalanan kişandin û ketin ser riya sefera Kurdistanê. Lê ji ber helwest û rawestandina bi rûmet ya hêzên welatparêz yên Başûrê Kurdistanê, hewesa dewleta Tirkiyê ya îlhaka petrola Kerkûk û Mûsilê careka din di qirika wan de ma. Turkiye di dîroka xwe ya nêzîk de, tu carî weha bêçare û tenê nemaye. Ev ne hew ji bo gelê Kurd, herweha ji bo çîna karker û kedkarên Turkiyeyê jî serketineke girîng e. Helwesta kurdan ya bi biryar, pêşî li ber maceraperestiyeke nû ya dewleta Turkiyeyê girt. Lê wezîfeya esasî ya li dijî pêşketina nîjadperestî, şerxwazî û dijmina-tiya gelan dikeve ser milên çîna karker, kedkar, şoreşger, demokrat, aştîxwaz û hawirên mirovperwer yên Turkiyê. Divê ew li welatê xwe li dijmin bigerin û li ser vî xakî vî bixenikîne. Divê bê zanîn ku di bingehê dijberî, nîjadperestî, zilm, zordarî û kedxwarinê de, dîlgirtina gelê Kurd heye. Eger em bixwazin bi rastî ruhê şoreşgerî yê 1ê Gulanê fêm bikin, divê di serî de ya gelê Kurd em mecbûrin mil bidin têkoşîna azadî û serxwebûna gelan.

Bi munasebeta 1ê Gulanê em careka din gazî çîna karker, gelên kedkar û hêzên şoreşger û demokrat yên Turkiyeyê dikin û diyar dikin ku dijminê herî mezin di hundur de ye. Rejîma kolonyalîst ya Kemalîst hedefa me ya hevbeş e. Weke rejîma Seddam, heta ev rejîma xwînrêj ya Kemalîst neyê rûxandin; ne azadiyek bi rastî, ne aştî û demokrasî têtê û ne jî zilm û zordarî û kedxwarî ji holê radibe.

Herweha em gazî şoreşger û demokratên turk, kurd û hemû neteweyên din dikin ku em bi hevre vê roja bi mane, 1ê Gulana 2003an, di destekî de sembola azadiya neteweyî meşala Newrozê û di destê din jî alaya 1ê Gulanê ya ked û enternasyonalîzmê pîroz bikin.

**Bijî 1ê Gulanê!**
**Bijî yekitiya gelan!**
**Bijî têkoşîna azadiyê ya gelê Başûrê Kurdistanê!**

**RÊXISTINA SOSYALÎST YA DEMOKRATÎK YA KURDISTANÊ**
**(RSDK)**
**KOMÎTEYA BIRÊVEBIR**

---

# JIBO SERKETINE YEKETÎYA KURDAN PEWÎST E!

Şerê ku YD Emerîqa û Birîtanya li dijî Saddam dest pêkirin ne şerê kurdan e. Ew şer ne jibo xelasîya kurdan, ne jî jibo demokrasîye tê kirin. Ew şer jibo kontrola petrola Kurdistanê û Iraqê; her wiha jibo kontrola askerî û sîyasî ya mintiqê dest pê kiriye. Li alîyê din ew dewletên ku li dijî şer in (wek Fransa û Rusya) ne jibo xêra kurdan û ne jî jibo demokrasîyê li dijî şer derdikevin.Ne xêr! Ew jî jibo ku kontrola xwe li ser petrolê û mintiqê wenda negin li dij in.

Wekî her mirovekî sosyalîst ez jî li dijî şer im. Lê ez li hember şerê ku li dijî yek wek Saddam (ku qatîlê sedxazar kes e) tê kirin cihê xwe nagrim û tevî protesta wî jî nabim. Ew sosyalîst û komînîstên ku li dijî şer in (bi taybetî jî sosyalîstên Turkiye) di esli xwe da li dijî YDE ne li dijî şer in. Eger ne verganî bû, ewê siftê li dijî şerê ku Saddam bi Iranê ra heşt sala kir û bû sewema kûstina mîlyonek însan derketana û dê ew protesto bikrana. Herwiha ewê li dijî şerê ku Saddam sî sala li hember kurdan dike dergetna û wê li dijî qatlîama Helebçe protestên geş pêk banîna û mîna îro bi sedhezaran li koça bimeşîyana. Lê mixabin, ew ji van kirinên hov ra bê deng man. Dîsa ew ji êrîsên ku dewleta Tirk li dijî me kurdan dike, bêdeng mane û hêjî bêdengin. Navê vê tewrê durûtî ye.

Kurdistana başûr ew heştê û pênc(85) sala jibo azadîyê bi dewleta Iraqê re di şer da ye. Armanca kurdan ku rejîma Saddam helweşe û li cihê wê dewletek federal û demokratîk be çêkirin. Civînên ku 2002 li Londone û 2003 li Selhedinê çêbûn, da ew armanca him muhalafeta Iraqê qebul kir, him jî YD Emeriqa û Brîtanya. Yanî piştî helwaşandina Saddam, di ava kirina dewletek nu li Iraqê ***Komera Federal Ya Kurdistana Iraqê*** yek ji ew dewletên federal bû. Di vê babetê da stratejîya Kurdistana başûr û yên YDE û Britanya bûn yek.

Di rewşek werga da divê kurdan çi bikra? Yan ewê li dij şer derketana, yan jî dê tekoşîna jibo azadî û xelasîyê ku sî sal berê li dijî Saddam dest pê kiribû berdewam bikirna. Rêkî din tûnebû li ber wan.

Hezên sosyalîst, komînîst û sosyal demkorat uwd ji kurdan dixwastin ku ew li dij şer an jî bêteref bimînin. Tawerekî anî jibo me kurdan xwe kûştin bû. Jiber ku di praktîke da dihate we maxne em piştgiriya Saddam dikin. Ev jî îxaneteke herî mezin bû jibo me kurdan. Li alîyê din kurdan rê ji dewleta Tirk ra vedikir ku ew bên Kurdistanê dabigirtaya. Jiber ku YDE û Brîtanya bê pişt kirîya kurdan dê bê şik tîfaq bi dewleta Tirk ra çêbikrana û şertên tirkan ku dixastin îkdidara Kurdistana başûr ji binî da ji ortê rakin dê qebûl bikirna. Dewleta Tirk dê êrişî ser kurdan bikra û ew azadîya ku piştî şere körfeze ketibû destê me dê bihata helwesandin. Ew jî pelciqandina rexistina kurdî bû li başûrê welat. Bê gûman ye tesîrekî negatîv li ser rêxistina netewî ya parçên din jî bikra. Herwiha li Iraqê di orgenîze kirina rejîmek nu da dê kurd nebûna xudî deng. Alternatîva herî rast têkoşîna xelasîya milete kurd ku berî sî salî li dijî Saddam dest pêkiri, divê dom bikra.

Em jî dizanin ku YDE û Brîtanya ne jibo xelasîya kurdan bi Saddam ra şer dikin. Lê Kurd jibo xelasîya dikarin ji rewşê îstîfade bikin. Xelasî û azadîya kurdan gavek jibo demokrasîya gelên rojhelata navîn e. Eger ew bi alîkarîya YDE hatiye qezenc kirin jî verganî ye.

Him berî şer him ji piştî şer partîyên kurdên başur li hember YDE hewildana xwe wek aliyekî serbixwe danîn. Seroke KDP M. Barzani payiza çûnî li Theranê li ser pirseka rojnemavanekî, anî ziman ku kurd wek quwetek serbixwe tevî vî şerî dibin. U dîsa piştî şer, him M. Barzanî, him jî seroke YNK C.Talabanî di şirovên xwe yên jibo pêşerojê dîyar kirin û anîn ziman ku divê Iraq ji alî iraqîyan va be îdare kirin û divê YDE li Iraqê û Kurdistanê zêde nemîne. Eger ew bimînin dê tikevin rewşa dagirkerîye. Her du serokên kurdan bi yek dengî dîyar kirin ku divê dewleta Iraqê federal û demokratîk be. Her wiha, wan li hember tehdît û proveqasîyonên dewleta Tirk jî tawrekî baş û xûdî prensîp şanî dan. Ew tawir, bû sebeb ku dewleta Tirk newerî êrîş bibe ser Kurdistanê.

Em kurd û bi taybetî jî kurdên sosyalîst bînin bîra xwe ku sîyaset îro bê dost û heval naçe serî. Jibo serketinê pewistî bi dost û hevalan heye. Miletekî wek miletê kurd ku hatîye bindest kirin dostên wî gelên navnetewî û rexistenên çep û sosyalîst in. Lê mixabin pir caran van hêzana alîkarî û piştkiriya xwe ji kurdan ra sedî sed nişan nedane. Her çiqes ew bi devkî bêjin di praktîkê da li dijî wê tişt hatine kirin. Numunên vê gelek in. Di vî şerî da jî em dibînin dema ew li dijî şer derdikevin ku ne bi dilê wan be jî ew dibin şirîkê Saddam. Em şahîd dibin ku di van protesto û xwepêşandanan da jibo azadî û xelasîya kurdan yek daxwazî jî neyê kirin. Ew hatine ji bîrkirin. Jiber vê jî ez dibejim çi mixabin tu carî dostên kurda yên bi dil û can çênebûne. Dostên ku hene û hebûne li ser stratejîya manfeetê xwe piştkirîya kurdan kirine.

Îro jî verga ye. YDE jibo manfeetê xwe bi kurdan ra tifaqê dike. Lê ev bi xwe ra îmkanan jî çêdike ji bo me. Mimkune ev yek bibe azadî û xelasîya başûrê Kurdistanê. Serketina wê di destên me kurdan da ye. Divê sî(30) milyon kurd wek yek dengî, bê şert û bê gilî û gazinc piştgirîya Kurdistana başûr bikin û li xwedî derkevin. Divê em zanibin îmkana ku îro ketiye destên me tu carî neketîye. Divê em bi hemû îmkanên xwe bi bîr û bawerên xwe ew qezencên ku bi xwînên şehîdan bi dest me ketine biparêzin.

Berpirsîyarîya me ya yekem em hewl bidin ku yeketîya di mayna partîyên Kurdistana basûr da çêbûye bên paraztin. Heqî kesî tûne ku mayna kurdan xera bike. Rexnên ku em li wan bikin divê xizmetî yêketîya wan bike. Ne ku em piştkirîya alîkî bikin û alî din jî pîs bikin. Di rewşek wek îro da ev xerabîya herî mezine jibo kurdan e. Ji bîra mekin ku dema kurd yekbûne wan gavên mezin û serketî avêtine. Lê dema ew ne yek bûne qezencên deh salan bi carekê ra xera kirine. Rewşa kurdan xesas e, dujmênên me gelek in; û li hevîya qelsîyek me ne. Divê em bi van zanabûnan gavan bavêjin.

Ez bawer nakim ku YDE yê bixwaze civatek wekhevî-demokratîk li Kurdistanê û Iraqê ava bike. Ji xwe ev yek ne aramnaca wan e jî. Em hemû dizanin ew jibo çi li wir in. Lê, em kurd dikarin ji vê rewşê îstîfade bikin û civatekî wekhev û demokrat çêbikin. Ji xwe bê civatekî wekhevî çêkirina civatek demokratîk jî biya min zehmet e.

www.arsivakurdi.org

Li alîyê din hinek daxwazîyên me jî ji partîyên Kurdistana başûr hene.

1. Divê YNK û KDP li ser paraztin û hebûna Komera Federal ya Kurdistana Iraqê wek yek can, yek deng û yek hêz bin. ***Jibo serketinê yeketî pêwist e!***

2. Divê herdu partî û hêzên din li Kurdistana başûr li gor prensîbên ku vê dawîye li ser yekîtî hate çekirin, yek parlement, yek hukumet û yek serokwezîrê Kurdistanê be helbijartin. Divê rêxistina leşkerî ji partîyan bê qetandin û rêxistinekî leşkerî yê serbixwe, lê bi hukumeta û parlementa Kurdistanê va giredayî be çêkirin. Yanî divê leşker, polis û paraztin ya kurdî û Kurdistanî be, ne giredayî partiyên siyasî be.

3. Divê ew bajar û gondên ku ji leşkerên Saddam hatine azad kirin ji runiştivanên wan qorumên revebir bên çêkirin. Di van qoruman da divê kurd, ereb, turkmen û suryanî bên temsîl kirin. Herwiha divê kurdên ku Saddam ji mal û warên wan bi zorê bargirin danî dîsa vekerin ser varên xwe û divê dewleta Federal ji wan ra alîkar be. Lê divê ew nebe sewama erebên ku Saddam ew anîn ser cih û warên kurdan bi zore ji wir bên derkirin. Divê jibo wan jî cih li Kurdistanê hebe. Divê armanca me avakirina Kurdistanek wekhevî, pirrengîn û pirdengîn be.

Jibo vê jî ew yekîtî û hevkarîya herdu partî, YNK û KDP ku li ser bingeha avakirina Kurdistanek Federal hatine cem hev divê dom bibe û geş bibe.

5.Divê KDP û YNK di şer da bi ala Kurdistanê bimeşiyana, ne bi ala partiyên xwe. Ew kêmasiyekî mezin e. Işaretên ku em didin dinyayê divê işaretên ku em kurd neteweyek in û ala me ji yek e. Me dixwast ku li Kerkukê, li Mosulê, li Erbilê û li Silimanyê bes ala rengin li bircan be dardagirin. Bi hêviyên wan rojan.

***Nisan 2003/ Vakkas CELIK***

## DI QRÎZA IRAQ DE REWŞA KURDISTAN

Ji alî Emrîka ve avakirina "Sazûmana Cîhanê ya Nû" berdewam dike. Loma Emrîka hemû plan û programê êrîşa Iraq'ê amade kirîye. Lê ji bo ku êrîşî Iraqê bike, destûra Yekîtîya Netewan, alîkarî û hevkarîya dewleta Tirk û Opozîsyona Iraqê, ji xwe re grîng dibîne. Îro di nava opozîsyonê de jî hêza di warê sîyasî û leşkerî ya herî birêxistînî gelê Kurd e. Lê ji bo Emrîka Saddam bixe, petrola Mûsil û Kerkûkê têxe bin kontrolê, li herêmê îstîkrarê saz bike, alîkarî û hevkarîya Kurdan grîngtirîn e. Lê hevkarîya Emrîka ya bi Kurdan re, dewleta Tirk zehf aciz dike. Lê dewleta Tirk û Emrîka jî hevalbendên hev yên pêncî sale ne.Di vê rewşê de di navbêna Tirk û Kurdan de wê helwesta Emrîka çi be; an divê helwesta Kûrdan çi be ku destkevtî û mafê xwe biparêz e?

Gelê Kurd berî bi 80 salî fersenda rizgarîyê wenda kir. Ger gelê Kurd, di warê netewî, sîyasî û leşkerî de bi rêxistin ba û yekîtîya xwe saz kiriba, di Konferansa Lozanê de mafê wî binpê nedibû, nedihat parçekirin û nedibû mêtingeha çar dewletên ku ew bixwe di bin dagîrîya emperyalîstan de bûn. Piştî 80 salî, gelê Kurd, li rojhelatê Kurdistanê, îro dîsa ew fersenda ku ya wê rizgar bibe, yan jî wê bindest bimîne bi dest xistîye. Lê îro ew tiştê ku me dilgeş û şa dike, Gelê Kurd di warê sîyasî, aborî û leşkerî bi rêxistinî ye; hevkarî û yekîtîya xwe ya netewî saz kirîye.

Piştî şerê kendavê û raperîna gelê Kurd û parastina Hêza Mîrkut, gelê Kurd bijartinên demokratîk pêk anî û parlmenta xwe sazkir. Di derbarê gelê Kurd û Kurdistanê de, êdî Parlamenta Kurdistintanê biryar dida: bi gelek biryaran re biryara Kurdistanek Federal jî da. Ev rewşa her ku çû neyarên gelê Kurd, yanî dewletên mêtinkar xist hundir xofa ku Kurd bibin dewlet û sibehê alîkarîya birayên xwe yên di bin destên wan bikin.Her çendîn dewletên dagîrker yên herêmê, ew xistin bin gemaroyê, derî li wan girtin û riya xwarin û bazirganîyê li ber wan birîn, ajan û sabotor bera pêxîla wan dan, bêhejmar suîkast û sabotaj dan kirin, ji bo berhevdana gelê Kurd hemû îmkanê xwe bi kar anîn, lê dîsa jî nikanîbûn xweparastin, xweîdarekirin û demokrasîya gelê Kurd xira bikin. Ev duwanzdeh sal in ku gelê Kurd bi awakî demokratîk xwe îdare dike.

Ji şerê kendavê de armanca Emrîka, dawî li desthelatîya Saddam bîne û herêmê têxe bin kontrola xwe. Lê pêşî pirsgirêka ku kê li şûna Saddam bike desthelat derket holê. Loma demekê opozîsyona Iraqê ji bo desthalatîyê bigire destê xwe amade kir.

Xalit Uso

# BİR DEVRİN KAPANIŞI

Rifat Sefali

Saddam'ın devrilişi ardından Irak'ta gözlemlenen kaos ve anarşi ortamı, çok özel bir durum ve ilk olarak karşılaşılan bir olaymış gibi, özellikle de uluslararası medya tarafından kamuoyuna yansıtılırken, olayın ne kadar objektif bir biçimde değerlendirildiği ise, ayrı bir tartışma konusu olarak gündemimizi işgal ediyor. Ne yazık ki, olayın baş müsebbibinin Kürtler olduğu Türk basınında işlenirken, küçük harflerle de olsa kimi sol çevreler de bu propagandaya alet oluyorlar.

Burada Irak'ta yaşanan bu kaos ortamının neden ve niçinlerini biraz açalım.

Kaos ve anarşi ortamı durup dururken oluşmaz. Dünyanın başka birçok yöresinde gördüğümüz gibi, devlet yönetiminin sarsıldığı veya yıkıldığı yerlerde, özellikle de baskıcı yönetimlerde daha sık rastlanılan yağma, talan ve çapulun en azından belli bir dönem "yeni bir irade yaratılıncaya kadar" hayat bulduğu yaşanılan bir gerçekliktir. Bu durum, sosyalist sistemin yıkılışında, Balkan ülkelerinde, keza ekonomik problemlerle boğuşan Latin Amerika ülkelerinde, siyasi, etnik ve dini problemlerin yaşandığı Afrika ve Asya'da çok canlı bir biçimde yaşandı. Medya dünyayı öyle bir küçültmüş ki, dünyanın neresinde yaşanırsa yaşansın, bu tür olaylar anında film şeridi gibi, ama canlı yayın olarak gözlerimizin önüne seriliyor.

Yaşanan bu olayları çıplak gözle izleyip yorumlamak varken, nedense bazı kesimler olayları farklılaştıran gözlüklerle izleyip algıladıkları biçimlerde yorumlamayı maharet ve irfan sayıyorlar. Bu kesimlerden özellikle sistemin savunucularını, devletin yüce çıkarlarını savunanları ve "bölünme korkusu" yaşayanları anlamak pekala mümkün. Ancak, sistemle problemler yaşayanların sistemle ayrılaşan çözüm yollarını zorlamaları, pek anlaşılır görünmüyor. Şunu anlayabilseler: Korku ve kaygıların devamı, baskı, zulüm ve sömürgeci sistemin yaşıyor olmasındandır. Bu sistem bir bütün olarak çökertilmezse dahi, sistemin yaralar alması veya zincir olarak adlandırılırsa bir halkasının kopması, korkuların bir derece aşağı çekilmesiyle özdeştir. Kuşkusuz bu durum olayların daha net izlenmesine de kaynak oluşturur.

Türk medyası ikinci Körfez Savaşı boyunca "savaş karşıtı" bir tavır sergiledi. Tırnak içine aldığım savaş karşıtlığını biraz tartışmakta fayda var. Bu durumun bir kaç boyutta değerlendirilmesi gerekiyor.

Öncelikle savaş karşıtlığının bir bütünsellik içerisinde ele alınması gerekir. Bu bölgede uzun yıllardır bir savaş yürütülüyor. Bu savaşta Kürt halkı bir çok kez soykırımlar yaşadı. Doğal olarak bu savaşı süreçle örtüştürürsek, hem birilerine haksızlık edilmemiş olur, hem de Kürtlerden çok farklı beklentiler biraz törpülenmiş olur. Doğru olan da budur. Yoksa Kürtler savaşı istemiyorlar, onlar uzun yıllardır baskı, zulüm, işkence, ilhak, işgal, sömürü ve soykırıma uğrayan bir toplumdur. Bu durumdan kurtuluşun tek yolu olarak kendilerine dayatılan savaşı yürütüyorlar. Kürtler, bugün Irak'a savaş açan kesimin istem ve çabası sonucu ülkelerinin parçalı sömürge bir konuma getirildiğini de çok iyi biliyorlar. Ve savaş karşıtlarını bu süreç içerisinde yanında görmek istemesi kadar doğal ne olabilirdi ki. Ama çok garip bir şeyler oluyor. Türkiye'de herkes, Kürtleri Saddam ile aynı kulvarda, Kürtlerin hedefini küçülten kesime karşı bu koşullarda savaşmasını istiyorlar. Kendi ulusunun ve ülkesinin çıkarlarını ön plana alanlar, Kürtlere, kendi ulusal çıkarlarını gözetme ve korumayı lüks sayıyorlar. Bu düşüncenin sol adına hareket eden kesimlerde de hakim olması, doğal olarak Kürtleri daha çok yaralıyor.

Savaş karşıtlarının, savaşın 21. gününden sonra nasıl çark ettiklerine bakılırsa, Basra'daki kaos ortamını tartışmak, biraz yersiz kalır diye düşünmek abartı olmasa gerek. Basındaki kaosu tartışmak daha ivedilik arzediyor. Çümle savaş karşıtları, bir kısmı büyük bir kısmı da küçük harflerle *"keşke ikinci tezkereyi çıkarsaydık ve Irak'taki yeniden yapılanma ve oluşturulacak iradede söz sahibi olsaydık"* demeye başladılar. Savaşa uç noktada karşı çıkan muhalefet partileri ise *"Kuzey Irak'a girmek için zaman kaybetmemek gerekir. Zaten orada idik. Daha güçlü bir şekilde orada olalım"* derken, Kuzey Irak'a girmenin savaş gerekçesi veya işgal ve ilhak ile özdeş olmadığını savunabilecek birileri çıkabilecek mi? Öyle görünüyorki Türkiye'deki savaş karşıtlarının, bu savaş karşıtlığı, kafalarında şekillendirdikleri Misak-î Milli sınırlarıyla sınırlıdır. Sorun gelip Misak-î Milli sınırlarına dayanınca akan sular duruyor, savaş karşıtlığıda bitiyor. Sağcısı-solcusu, muhafazakar-liberali hemen bütünleşebiliyorlar.

Türk basınını en fazla etkileyen ise Kerkük ve Musul'da yaşanan talan ve yağma olayları olunca işin hinliği de kendiliğinden ortaya çıkmış

www.arsivakurd.org

weha dîrokî ye. Divê hêzên Başûrê Kurdistanê, di rewşeke weha zehmet da xwe tenî hîs nekin, bi cesaret bin û bizanibin ku 30 milyon Kurd digel wan in. Divê bê xûyakirin ku heta nûha hewildanên hêzên welatperwer yên Başûrê Kurdistanê, şerefa neteweyî ya gelê Kurd bilind kirine û heyecanek dane wê. Bi taybetî hewildan û agahdarîyên serokê PDK-I Birêz Mesud Barzanî ciyê pesindayîn û îftîxarê ye ku mexsedên dewleta Tirk di qirika wan da hişt. Gelê Kurd ta dawîyê dê digel vê hewildana neteweyî be. Protestoyên bi milyonan insan li Başûrê Kurdistanê, li ser axên Kurdistanê ku di bin dagirkerîya Îranê, Tirkîyê û Surîyê da ye, li metrepolên van welatan û li Ewrûpayê, li Emerîka û Australyayê bilindbûna dengên berxwedanê û protestoyan nîşana vî tîştî ye. Kurd, piştî trajedîya Halepçe û Xelîcê careke din ala serhildana neteweyî bilind dikin. Ji partî û rêxistinên sîyasî ra vatinî dikeve da ku van hewildanan, serhildanên neteweyî bi pilan û bi program bikin hewldanên navendî yên parastinê û hîn jî wan xurttir û çalaktir bikin.

Di vî warî da, pêwist e di bin pêşengîya Platforma Neteweyî ya Bakûrê Kurdistanê (PNK) da Platforma Kurdî li Ewrûpayê ku ji hêzên ronakbîr, demokratîk û sîyasî pêk tên, divê hê çalaktir planên hewildanan çêkin û piştgirîya xwe bi birayên xwe yên Başûr ra pêkbînin. PNK divê digel hêzên perçeyên din, ev serhildana neteweyî ya gelê Kurd di nav hûnandina yekîtîyê, hevkarîyê û têkoşînê da çalaktir bike û jibo vî tiştî çi ji dest were divê bi cîh bîne.

Her weha gelê Kurd di bin van mercan da amadekirina Newroza 2003'yî pîroz dike. Bi hêvîya ku Newroza 2003 bibe "Bahara Kurd" ya nû, em bangî hemû hêzên welatperwer dikin da ku Başûrê Kurdistanê biparêzin. Em şehîdên Halepçeyê bi bîr tînin û cejna neteweyî Newrozê pîroz dikin.

16 Adar 2003

**RÊXISTINA SOSYALÎST YA DEMOKRATÎK YA KURDISTANÊ**
**(RSDK)**
**KOMÎTEYA BIRÊVEBIR**

---

oluyor. Şimdi sormak istiyorum: Kerkük ve Musul'da yağma yapanların alınlarında "pêşmerge" veya "Kürt" mü yazıyordu da yağma olayı onları bu kadar derinden etkiledi. Talana uğrayanların Kürt olduklarını neden görmezlikten geliyorsunuz.

Türk devletinin üst düzey yöneticileri de aklın sınırlarını zorlayarak Kürdistan'a müdahaleye zemin ararken, Türkmen olayını nufusa vurarak, *"bölgede 3 milyon Türkmen yaşıyor, bunların can güvenliğinden Türkiye sorumludur"* diyebiliyorlar. Şimdi düşünüyorumda "objektiflik"te sırayı kimseye kaptırmayan Türk medya ve siyasi çevreleri az buçuk bölgeye ilişkin coğrafi bilgileri kurcalasalar, Irak nüfusunun 24 milyon civarında olduğunu görürler. Şii ve Sünni Araplardan sonra en büyük nüfusu Kürtler teşkil ediyor. Kürtlerin nüfusu 5 milyon civarındadır. Bütün araştırmacıların verilerine göre de bütün Irak'ta Türkmen azınlığın nüfusunun üçyüz ile üçyüzyirmibin arası seyrettiği yönündedir. Nüfusa ilişkin açıklamayı yapmamdan kasıt, nüfus üzerinde oynamak değil, yağma ve talanda kimlerin haksızlığa uğradığının somutlaşmasını istememden dolayıdır. Sonuç olarak hem Kürtler, hem Türkmenler ve hem de Araplar bu talandan nasibini aldılar. Bu olumsuzlukların sorumluluğunu bir tek etnik gruba yüklemek realist bir yaklaşım olmayacağı gibi, dürüstlük olarak da adedilemez.

Tek etnik kökene tekabül eden bölgelerde ve ülkelerde dahi siyasi iradenin etkisi kırılınca bu türden çapulculuklara rastlandığına yukarıda değinmiştik. Basra ve Bağdat'ta da bu tür olaylar yaşandı. Siyasi irade ve otorite sağlanıncaya kadar da bu tür olayların bölgede yaşanacağı bir gerçekliktir. Umudumuz bir an önce siyasi iradenin oluşturulması ve otorite boşluğunun ortadan kaldırılıp istikrarın hakim kılınmasıdır. Ancak bu durum dezinformasyonun ve sansasyonel haberlerin önüne gecer.

Sonuç olarak: Kürtler dostlarından ve müttefiklerinden dostane bir yaklaşım bekliyor. Buna hakları da vardır. Kürtlerin bir kısmı uzun yıllar dostluk adına ulusal çıkarlarını ihmal ettiler. Varılan aşamada çok önemli bir süreç yaşanıyor. Keza bu süreç Kürtlere tarihi fırsatlar yaratmıştır. Bu fırsatları kullanmak Kürt halkının hakkı ve onun özgül iradesine bağlıdır. Özellikle dostlarımızdan bu hakkımızın tesciline ve irademizin tecellisine saygılı olmalarını bekliyoruz. Bir çok dünya halkı bu yolla iradelerini yansıtıp ulusal sorunlarını ya çözdüler ya da çözüme ilişkin yolu açtılar.

Hiç bir tarihsel dönemde Kürtler için ulusal ve uluslararası şartlar bu denli olgunlaşmamıştı. Dolayısıyla Kürtler bu şansı en iyi biçimde kullanmak istiyorlar.

**Nisan 2003**

www.arsivakurdi.org

çêkirin, li ser vî esasî bawerîyê ji hêzên hempeyman bistînin. Lihevhatina di navbeyna hêzên Başûrê Kurdistanê û muxalefeta neteweyî ya Îraqê di vî warî da xwedî girîngîyeke stratejîk e. Lê pirs, bi muxalefeta Îraqê ra lihevhatin têr nake. Di polîtîka DYE da ku ji terefan yek e, jibo pêşeroja Îraqê cîh û rola Kurdan dê çi bibe, ev girîng e. Bawerîya ku DYE dide Kurdan çîye, ji ber ku ew Başûrê Kurdistanê wek enîya şer û di vî şerî da Kurdan wek "mutefik" dibînin, ev girîng e. Pirsa esasî ku Kurd binirxînin ev e. Heta îro DYE Kurdan wek qerteke bazarkirinê xebitandîye. Rola DYE di têkçûna 1975`an da ji mêjûyê her kurdekî fahmker nehatîye jibîrkirin. Banga serhildanê ya Bavê George Bush ku di şerê Xelîcê da jibo Kurdan û Şîîyan kiribû û piştî wê trajedîya ku hatibû serê Kurdan, hin nehatîye jibîrkirin. DYE, dewleteke emperyalîst e ku her dem li gorî menfeetên xwe ketîye nav hewildanan. DYE, vî şerî ne jibo Kurdan û gelên Îraqê yên bindest û ne jî jibo bi gotinê azadî, demokrasî, aştî û istîkrara Rojhelatanavîn dixwaze. Di rastîyê da ev şerê petrolê ye. DYE, vî şerî jibo qeîmkirina bi destxistina petrolên Rojhelatanavîn û li gorî menfeetên xwe yên stratejîk ji nû ve şikil bide herêmê. Şerê Îraqê, tenê helqeya destpêkirina avakirina polîtîkaya nû ya DYE ye. Ev pilan gelek fireh e û li gorî stratejîya eskerî, sîyasî û aborî, pirralî ye. Piştî şer cîyê Kurdan di nav Îraqeke nû da, dê li gorî vî polîtîkayê bê tespîtkirin. Her weha di şer da û piştî şer, Kurd dikarin destkeftinên nû yên girîng bi destxin û dikarin destkeftinên nûha jî wenda bikin. Kurd pêwist e polîtîkaya xwe, stratejî û tektîkên şer li ser vê rastîyê ava bikin, li gorî guhertin û rewşa nû xwe amade bikin.

Îro jibo Başûrê Kurdistanê tehlûkeya herî mezin ji dewleta Tirk ya kolonyalîst tê. Dewleta Tirk ji roja avabûnê vir ve polîtîka xwe li ser înkar, helandin (asimilasyon) û qirkirina gelê Kurd çêkirîye û hemû bizavên neteweyî bi qetlîaman pelçiqandîye. Tenî Bakûrê Kurdistanê nekirîye hedef; ew di kijan perçe da dibe bila bibe, hemû Kurd kirîye hedef. Dewleta Tirk dixwaze ji rewşa şer feydeyê bigre û Başûrê Kurdistanê jî dagir bike. Petrolên Musul-Kerkûkê ji mêj ve hedefên dagirkerîya dewleta Tirk zêde dike. Û vê amanca xwe ya qirêj li çavên 20 milyonî Kurdên ku di nav sînorên wan da dijîn dinêre û dibêje, jibo vê yekê pirr vekirî tehdîdan dike. Polîtîka dewleta Tirk nûha li ser Başûrê Kurdistanê gurr dibe. Ew bi her awayî ketîye bin bandrola DYE û axên dewleta xwe pêşkêşî wan kirîye. Hukûmata Tirk li hember van tiştan tenê ji DYE tiştek dixwaze, bawerî jibo Başûrê Kurdistanê. Daxwazên wan yên aborî û yên din paşê tên.

Dewleta Tirk bi hemû dezgehên xwe ve, partîyên sîyasî yên Tirk, parlamana Tirk, çapemenîya (masmedya) Tirk, raya giştî û hwd. bi yek devkî Başûrê Kurdistanê ji xwe ra xetereke mezin û hedefa êrîşkirinê dibînin. Bi çi buhayî dibe mal bila bibe, ew dixwazin destkeftîyên Kurdên wê perçeyî ji holê rakin. Hedefa hewildanên aştîyê ku di raya giştî ya Tirk da çêbûye jî bi rastî ji bilî rawestandina şer ve zêdetir rawestandina destxistinên Kurdan e. Dewleta Tirk di eynê wextê da van hewildanên li hemberî DYE yê wek qerteke bazarkirinê bi kartîne. Ew biryara (teskereya) ku dê destûrê bidaya leşkerên bîyanî da ku bikaribin li Tirkiyê cîh bikin li Parlamana Tirkiye hat redkirin jî di encama polîtîkaya wê bazarkirinê da bû. Kes li hemberî madeya duwmîn ya teskereyê nebû ku ew destûrê dida da ku leşkerên Tirkiye derkevê dervayê welat (mexsed mudaxeleya Başûrê Kurdistanê bû). Ji xwe dema ew bixwazin dikarin biryareke weha her tim bidin. Heta pêwistîya biryareke weha jî tune ye. Ordîya Tirk ji xwe ji nûha ve bi hemû giranîya xwe ve û li herêmê cîwar bûye. Ji bilî çend ronakbîrên ku rastîyê dibînin, bi gotinê ji van hewildanên aştîyê tu dengeke cidî li hemberî dewletê dernakeve. Yên ku îro jibo aştîyê derketine kuçe u kolanan, li hemberî şerê qirêj ya dewleta Tirk li kê derê bûn ku 15 sal ev şer li hemberî Kurd hat domandinê, bi hezaran gundên Kurd ji xerîteyê xirab bûn, nêzîkî 5 milyonî Kurd ji ser axa xwe bûn, bi hezaran insan hatin kuştin û coxrafya Kurdistanê hat xirabkirin? Sedemê nermayî nîşandana dewletê li hemberî bi gotinê hewildanên aştîyê vekirî ye. Di vê navbeynê da hin derdorên Kurd ku bi aktîf di nav van hewildanan da cîh sitandin jî divê bê nirxandin. Ev derdorên ku sond xwarine da ku "parastina Misakî-Millî" û "yekîtîya dewlet û milet ji hev cuda nabe" û ketine bin emrê dewletê, êdî tiştên wan yên zêde ku ji gelê Kurd ra bibêjin nemaye. Bêguman li cîhanê ji her kesî zêdetir pêwistîya gelê Kurd jibo aştîyê heye. Lê gelê Kurd û rêxistinên wê yên demokratîk u neteweyî aştîyeke sexte na, aştîyeke adil û bi şeref dixwazin. Aştîyeke bi şeref û adil jî li ser hîmê demokrasîyê, wekhevî û azadîyê mimkun e.

Ji her çar perçeyên Kurdistanê gelê Kurd û hêzên wê yên welatperwer divê hemû tiştên xwe yên cuda li alîyek bihêlin û di vê pêvajoya dîrokî da destxistinên li Başûrê Kurdistanê biparêzin û pêwist e di serî da li hemberî dewleta Tirk û mudaxeleyên ku ji derve werin, rawestin. Divê gelê Kurd hemû hêzên xwe jibo vî tiştî seferber bike. Ev, jibo her Kurdeke welatperwer û bi namûs, vatinîyê ewelîn e. Ji Mahabadê ta Hewlêrê, ji Dîyarbekrê ta Qamişloyê her Kurdek li hemberî vatinîyeke

www.arsivakurd.org

# JI RAYAGIŞTÎ YA CÎHANÊ Û GELÊ KURD RA

Dema gelê Kurd pîrozkirina Newrozê amade dike, li herêmê û li Kurdistanê geşbûnîyên girîng çêdibin. Hezirîyên Dewletên Yekîtîya Emrîka (DYE) bo şerê Îraqê bi lez didome. Hezirîyên leşkerî ji gelek enîyan, her weha ji Tirkîye û ji Kurdistanê, tê maneya ku ji nûha pê ve bi emelî şer destpêkirîye.

Kurdistan di nav şerê germ û van geşbûnîyan da ye. Gelê Kurd di rewşeke xwe yê nazik ya dîrokî da dijî. Cejna Neteweyî ya gelê Kurd Newroz û bûyerên girîng yên meha Adarê ku di diroka gelê Kurd da çêbûne, di bin germahîya van geşbûyînan da derbas dibin.

Komîteya Birêvebir ya RSDK nirxandina vê pêvajoyê kir û biryar da ku bi minasebeta Newrozê ji raya giştî ya cîhanê û ji gelê me ra bide xûyakirin da ku di rewşeke weha nazik da ku şer nêzîk dibe, jibo parastina welat û neteweyê me, ji gelê me ra û hêzên wan yên welatperwer ra vatinî û berpirsîyarîyên ku divê bên şûnê, destnîşan kir.

Destpêkirina şikestina helqeyên kolonyalîzmê li Başûrê Kurdistanê vir ve careke din ev bûye navenda berxwedana neteweyî. Geşbûyînên şer û piştî şer ne tenê jibo beşa başûr, her weha bi encamên erînî û nehînî ve jibo hemû Kurdistanê û gelê Kurd dibe pêvajoyeke dîrokî ku qedera gelê me tayîn bike. Ji ber vê yekê ye ku îro li her çar perçeyên Kurdistanê dilê gelê me jibo Başûrê Kurdistanê lêdixe. Belam piştî ji pêncî sali zêdetir e ku têkoşîna demokratîk ya neteweyî ya dirêj ku bi sitirên çavan, bi xopan û bi xwîn hatîye gurr kirin, gelê Kurd 11 sal e ku li ser axa xwe azad û serbest dijî. Di serî da Parlaman û Hukûmat, her çiqasî di çerçeweya herêmî da be jî avakirina dezgehên demokratîk û neteweyî, destkeftineke herî girîng ya dîroka neteweyî ya gelê Kurd e. Li Başûrê Kurdistanê bi emelî Kurd bûne wek dewleteke neteweyî. Gelê Kurd û hêzên wê yên demokratîk li her çar




parçeyan xwedîtîyê li van destkeftinên dîrokî dike, jibo pêşerojê hêvîyek dibîne û jibo parastina wê ger pêwist be amade ye ku bedêlên mezin bide. Pirs, ne tenî pirsa Başûrê Kurdistanê ye, pirseke hemû Kurdan e ku bûye dozeke neteweyî.

Pirsa Îraqê û nêzîkbûyîna şer bi mehan e di rojeva hemû cîhanê da bûye pirseke yekemîn. Li cîhanê, Ewrûpayê û Rojhelatanavîn li gorî şer û dijî şer hêz cîyên xwe distînin. Hezirîyên şer yên DYE û hevalbendên wan jibo Îraqê êdî hatîye qonaxeke weha ku pêşî lê nayê girtin. Bi gotinê hêzên aştîxwaz jî di nav dà, herkes li gorî menfeetên xwe li şer dinihêrin. Weke RSDK berê jî me gotibû: Bi rastî gelê Kurd li hemberî şer e. Gelê Kurd bi xwe ji herkesî bêtir bi salan e di jîyana xwe da dizane ku şer xwîn e, xopan û histirên çavan e. Di rastîyê da ev şer ne şerê Kurdan e. Kurd ne sedemê şer e, ne jî xwedîyê qeweteke weha ye ku vî şerî bide rawestandinê. Di esasê xwe da ev şer di navbeyna hêzên emperyalîst û kolonyalîstên herêmê da ye ku menfeet û hukûmdarîyê dike hedef. Lê weha be jî encamên şer û şer bixwe ji hemûyan zêdetir Kurdan eleqeder dike. Her weha qonaxa ku em tê da ne, di serî da hêzên welatperwer yên Başûrê Kurdistanê, gelê Kurd û hêzên wê yên demokratîk u neteweyî, helwesta wan ya li hemberî şer cîyê girîngîyeke dîrokî ye. Divê Kurd, vê rewşa nû ku dertê holê û berberîyên hene jê feydeyê bistînin û li gorî feydeyên xwe yên dîrokî û neteweyî cîyê xwe bistînin û hewil bidin xwe. Helbet Kurd, kirinên Saddamê dest bi xwîn û hukma Baas ya kolonyalîst ku li ser gelên Îraqê bûye wek makîneyeke qirkirinê, ji bîr nekirîye. Daxwaza her Kurdekî ye ku hilweşandina vî hukmê xwînxwar ya zilmê ku li hemberî Kurdan qirkirinên giştî pêkanîye, bibîne. Lê pirsa esasî, piştî hilweşandina vê rejîmê, yanê piştî şer dê li Îraqê çi bibe, avakirineke çawa çêbibe û di nav vê avakirinê da cîyê Kurdan dê çi bibe, ev pirs e. Jibo Kurdan pirsa li hemberî rejima Îraqê bedêla şerkirinê dê çi bibe.

Ger Kurd naxwazin piştî şer li ser sifreya dîplomasiyê bibin xwarina guran, divê hesabên xwe baş bikin, ders ji dîroka xwe ya nû bistînin, li ser esasê menfeetên neteweyî polîtîkayeke bi eqil bidomînin. Bi hindikayî parastina ji nuxteya destkeftinên heyî ve hereket bikin. Lê di nav Îraqeke pirrdengî û demokratîk de dest ji hedefa Kurdistaneke federalî ku Musul û Kerkuk jî di nav sînorê wê da be, bernedin. Tifaq û pêwendî divê li gorî wê bê

www.arsivakurd.org